

## Ez perwerda dagîrker naxwazim

**N. Sumeye Edmî** Ji dûr ve sekinî û li wê avahiyê biçûk û kevin nêrî. Dît zarok yek bi yek dikevin wir . got:dayê?min li vir nehêle..!!Dayika viyan kenî û got: keça min, ev roja te yekemîn e li dibistanê ,çawa tu naçî?

dom»R:8





## XEIK JI XWE RE XEYALÊN MEZIN DIKIN Û JIBO PÊKANÎNA WÎ JÎ XEBAT

**N. Hasan Harrani**

Niha ez dixwazim bizanim ku çima Kurdan aqlekî dewletîyê ji xwe re ava nekir û çima her cara ku bi ked û berxwedanên mezin gelek destkevtîyên mezin bi destê xwe xistin û paşê çima derbasî destê hêzên miletên din bû?

Ev pirsekî gelek girînge ku divê her sîyasetmedar û rêberekî Kurd ji xwe re bike derd û serî li ser biêşîne, sedemên wê bibîne û fam bike.

dom» R:9

*Bideŝtveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (472)20-06-2024Buha (1000) Tûmen*



## Wan bi mêrxasî şer kirin û wek mêran mirin!

**N: Rojan Kurmanc**

Lê keleh dîsa li ber xwe dide û vê carê ava şêniyên kelehê qut dikin!Deriyên kelehê vedibin.

Esker û xamxwar dikevin kelehê! Mêr tev şer dikin û li pey hev dikevin erdê!

Leşkerek dîwarên kelehê nîşan dide!

Li wir çi diqewime?

dom» R:10

# Rêzdar Mistefa Hicrî daxwaz kir dosyeya Dr.Qasimlû bê vekirin

Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberî a hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, daxwaza rêkxirava Aştî bo vekirina dosyeya terora Dr.Qasimû wajo kir.

Roja Pêncşemî 17ê Cozerdanê, kek Mistefa Hicrî, bi mebesta peywestbûn bi hewla wajokirina daxwaza rêkxirava Aştî bo vekirin û bigerxistina dosyeya terora Dr.Qasimû li 35 saliya terora wî rêberê mezine gelê Kurd de, daxwaza rêkxirawa Aştî yê wajo kir.

Rêkxirawa Aştî li siwîsê bi mebesta vekirina dosyeya terora Dr.Qasimlû û bi terorîst nasandina spaha pasdaran li Ewrûpa, Daxwaza hevkarî li Kurdistaniyan kir.

Rêkxirava Aştî li welatê siwîsê li devedevê 35 saliya terora şehîdê nemir, Dr. Ebdulrehman Qasimû sekretêrê Giştî ê hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, ji aliyê Dîplomat-terorîstên rêjîma Komara Îslamiya Îranê ve, li rêya komkirina wajo, Îmzayan, hewla vekirina dosyeya vê terorê û bi terorîst nasandina spaha Pasdaran daye .

Divê derheqê de Rêzdar Mistefa Hîcrî liser rûpela xwe li tora civakî a X de ev hewl wajo kir, û daxwaz ji her takek bi helwêst kir ku beşdariyê li vê hewlê bikin.




Rêkxirava Aştî daxwaz ji hemû takekê bi helwêst ên Kurd kiriye ku beşdariyê li wajo kirina hewla vekirina dosyeya şehîd Dr. Qasimû û bi terorîst nasandina spha Pasdaran ji aliyê welatên Ewrûpayî û bi taybet welatê Siwîsê ve bikin.

## Hilbijartina 8ê Pûşperê jî çiyê din rewayetiyê nade komara Îslamî

**Daxuyaniya Navenda Birêveberiya Hizba dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq binav hilbijartina serokkomar li Îranê de**

Komara Îslamiya Îranê roja 8ê Pûşperê û piştî hatine kuştina Îbrahîm Reîsî, dê hilbijartina pêşwexte bo serkomar bi rê ve bibe. Gera 14 an a binav hilbijartina serkomar li Îranê de di demekê de dê bi rê ve biçe ku li hilbijartina gera 13 an a serkomariyê de Îbrahîm Reîsî bi dengê herî kême beşdaran, navê wî li sindûqan hate derê, lê piştî bûyerên mirna Reîsî, pirsa hestiyare danana kesekê bo dewsa Xamineyî û rewşa siyasiye taze a welat ev hilbijartina pêşwext hem bo rêjîma komara îslamî û hem bo gelên Îranê ku li du cibhên tevav bi dijî hev de cih girtine, cihê baldaniyê.

dom» R:2




## Bombexwaz dawiyê li civînên ji bo rêkeftina etomî tînin!

**N. Eskender Ceiferî**

Mezintirîn bombexwazên Rojhilatan Navîn, berpirsên rêjîma faşîstên Tehranê ne. Di rojên derbasbûyî de rêjîma Îranê careke din civînên ji bo rêkeftina etomî bi dawî anîn lê di hember de car din îdia kirin ku ew bombeyê naxwazin.


Ev jî hevdem e ligel gitinên lidij. Elî Şemxanî şêwirmendê ewlehî yê Elî Xamineyî dibêje heke Îsraîl û Rojava siyaseta xwe neguherin, dê Îran bombeyê berhem bîne.

Lê berpirsên din ên Tehranê tiştek din dibêjin û îdiayê dikin ku ew bombeyê naxwazin.

Ev jî di demekê de ye ku Berîtanya dibêje Îran dikare tenê di 2 rojan de biryarê bistîne û rêkeftin bê kirin.

dom» R:7

# Daxuyaniya Navenda Birêveberiya Hizba dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq binav hilbijartina serokkomar li Îranê de




## Hilbijartina 8ê Pûşperê jî çiyê din rewayetiyê nade komara Îslamî

Komara Îslamiya Îranê roja 8ê Pûşperê û piştî hatine kuştina Îbrahîm Reîsî, dê hilbijartina pêşwexte bo serkomar bi rê ve bibe. Gera 14 an a binav hilbijartina serkomar li Îranê de di demekê de dê bi rê ve biçe ku li hilbijartina gera 13 an a serkomariyê de Îbrahîm Reîsî bi dengê herî kême beşdaran, navê wî li sindûqan hate derê, lê piştî bûyerên mirna Reîsî, pirsa hestiyare danana kesekê bo dewsa Xamineyî û rewşa siyasiye taze a welat ev hilbijartina pêşwext hem bo rêjîma komara îslamî û hem bo gelên Îranê ku li du cibhên tevav bi dijî hev de cih girtine, cihê baldaniyê.

Cixîza alîgirên rêjîmê ku roj bi rojê berteng û biçûktir dibe,hemî cehda wê eve ku li nêrîna bo 3 pirsên Hêjmoniya serbazî û navokî, cihgirê rêberî û henberbûn digel nerizayetiya xelkê, hemî aliyên deshilatê bi awayekî beredayî li qorixa xwe û bi der ji îrada xelkê de bihêle. Li wê derheqê de herwekî li parzûnkdana berbijêran ji aliyê şêwra nobedar de îsbat bû, heta kesên wekî Larîcanî û Ehmedînijad jî ku dehan sale serbazê wilayetê û parêzerê sîstima komara îslamî bûn, ev jî niha nikarin li nava wê baznê de ci bibin.

Bi raya rêjîmê û xudî Xamineyî ve encama wê gera hilbijartina serkomariyê nabe hindî libekê pirsyaran li ser mesela cihgirê Rêberî çêbike û bandorê dabinê ser guherîna helwêst û reftara rêjîmê li henber mesela navokî û herwisa civatgeha cîhanî û wan tevdaniyên ku li nawçê de dike hebe. Lewra li vê binav hilbijartinê de jî naveroka îdolojîka rêjîmê û paşvekêşînekirina li henber daxwaziyên xelkê de, serweyî hemî giringiyên Xamineyî û rêjîma wiye.

Lêbelê li derheq helwêst û dîtingeha gelên Îranê li pêywendî digel wan hilbijartinan ve dibe em bêjin ku, Piraniya xelkê ti baverî bi wê rêjîmê û bavir bi guhertinan li wê sîstimê de nemaye. Her 3 mehan berî niha anku roja 11ê Reşema 1402an a rojî de bû ku xelkê bi berfirehî hilbijartinên Meclisa Şêwra Îslamî û Xêbrigana Rêberî baykot kirin û bi neçona xwe bo ser sindûqên dengdanê, peyama nexwastinê û haşakirina wê rêjîmê gihandine hemî cîhanê. Lewma gorî reftar û helwêsta wan li henber pirs û bûyerên çend salê derbasbûyî, xelkê Îranê bo carekî din û li roja 8ê Pûşpera îsal de bi baykota wê binav hilbijartinê û neçona bo ser sindûqên dengdanê, dê peyama mafxwazane û domandina tevgêra nerizayetiya xwe li henber wê rêjîmê de ducarî bikin.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tewî xatircembûn ji helwêsta xelkê li henber wê maşkanêya hilbijartina serkomariyê û pêşengayetiya xelkê hişyare Kurdistanê li rûbirûbûna digel komara îslamiya Îranê, neçona ser sindûqên dengdan û hilbijartinê, helwêsta baykotê bi rast û rewa dizane.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bo piştîwanî ji xebata mafxwazane a gelên Îranê û “ne” gotinekî dinêye biqawet bi wê rêjîmê û pêngav havêtina bo aliyê pêkwebûnê û guherîna bingehîn û dêmokratîk bo Îrana pêşerojê, daxwazê ji tev hêz û aliyên opozîsyonê û dijberên rêjîma komara îslamiya Îranê dike siyaseta baykota hilbijartinê û haydana tev qat û texên civatgeha xelkê Îranê bo “ne” gotinekî dinê bi rêjîmê bigrne bera xwe.
Her li wê derheqê de em rû dikne pêwajoyên cuda cudaye navxwyê welat û kesayetiyên xwedî bandore siyasî û medenî ku li rewşa niha a zal bi ser welat de ku gelek xisar û nirx ber wan kevtiye, bi wergirtina peyamên tevgêra “Jîna” yê bi bê du dilî piştewaniyê ji tevgêra mafxwazane a xelkê bikin.

Her lêre ji em daxwazê ji tev wan pêwajo û kesayetiyên navxweya welat dikin ku serdemekê bi nav û hizra cuda cuda ve xebat dikirin û li pêwajoya tevgêra Jin, Jiyan, Azadî yê de elheq ref û eniya gel hilbijartibûn û bi aşkera rexne ji kiryarên tepeserkaraneye rêjîmê digirtin, bi derbaskirina kes yan hinek kesên heta qasekê cuda jî li parzûnkê şêwra nobedar- ew jî tenê bo bazargermiyê û zêdekirina asta beşdariya xelkê, du dil nebin.
Anîna kesekî heta qasekê cuda ji destnîşankiryên beyta rêberî, bi wateya bavera wê rêjîmê bi berfirehî û aliyê kême wekirina derfeta cuda nîne, belku pîlaneke tenê bo jêhel birina asta beşdariya xelkê li hilbijartinande û piştre xwe daberizîna deshilatdarên wê rêjîmê.

Ku wisaye li wê qonaxa rûbirûbûna xelkê û rêjîmê de, hewceye tev aliyên siyasî û kesayetiyên navxwe û derveyî welat yêkgirtiyan bi girtina pêşêye siyaseta baykotê û neçona ser sindûqên dengdanê, weke ceribandinek ji bandora gelhevbûnê û karê hevbeş, fikrê ji nexşerêkekî girseyî û yêkgirtiyane bo pêşeroja tevgêra mafxwazane a gelên Îranê bikin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Birêveberî**
**12ê Hezîrana 2024 a Zayînî**

# Kak Mistefa Hicrî: Tepeserî û girtin û îşkencê nekariye îrade û bavera bilind a neteweyekî azadîxwaz bo geheştina bi rizgariyê lewaz bike

**Kak Mistefa hicrî Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li derheq sepandina sizayê bidarvekirinê bi ser xelkê de piştî şorişa Jînayê peyamek belav kir.**

**Deqa peyamê wihaye:**

Komara Îslamiya Îranê, bi dirêjiya deshilata xwesepêne xwe de, tepeseriya sîstimatîk bi dijî netewa Kurd û azadîxwazan girtiye bera xwe. Zêdebarî berdewamiya êrîşa hemî aliyane bo ser Kurdistanê, piştî serhildana Jîna yê û berxwedana xelkê Rojhilatê Kurdistanê, bo demekê jî li siyaseta tepeserî û sizadana xortên xebatkar û xwedî helwêste netewa me nesekiniye.

Dasepandina hikmê nerewaye sêdaredanê li bêdadgehan de, parek bûye ji vê siyasetê û li heyamê 2 salên derbasbûyî de, li deverên cuda cudaye Kurdistanê çendîn hikmê bidarvekirinê bi ser xortên Kurd de sepandine.

Yêk ji wan kesane Mihemed mehdî Keremî " Komar" xelkê Bîcarê bû ku mixabin hikmê bi serde sepandiye wî, li Kerecê hate cîbicîkirinherwisa Riza Resayî, xelkê bajarê Sehnê û ji bavirmendên olê Yarî, Şahîn Wesaf xelkê bajarê Selmasê û Mihemed Xizirnejad, mamostayê olî xelkê bajarê Bokanê ku vê dawiyê hikmê sêdaredanê bi ser de hatiye sepandin, ji wan kesane ne ku gefa bidarvekirinê li ser wane.

Em daxwazê ji saziyên mafê mirov dikin ku bo hilweşandina hikmê sêdaredana wan kesane ku bi sûçê berevanî ji kerameta mirovî û mafê berheq, sizayê dijemirove mirinê bi ser wan de hatiye sepandin, cehda xwe bikin. Bê guman her wek dîrokê



daye selimandin, tepeserî û girtin û îşkencê nekariye îrada bilind û bavera qahîmê neteweyekî azadîxwaz, bo gehiştina bi rizgariyê lewaz bike.

**Mistefa Hicrî**
**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**20 ê Cozerdana 1043 a Rojî**

# Navenda Birêveberiya Giştê ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq azakirina bikerê tawanên mezin, Hemîd Nûrî, daxuyaniyek belav kir

Azadkirina Hemîd Nûrî, bikerê tawanên mezin û yek ji berpirsên Komara Îslamiya Îranê, ji aliyê welatê Swêdê ve, cihê şermezariyê ye û vê bi biryareke narewwa dizanin.

Belavbûna nûçeya azadkirina Hemîd Nûrî ku bi tawana komkujî û bidarvekirinên bi kom a girtiyên siyasî li Havîna sala 1367 a Rojî de karbidest û dadyarê girtîgeha "Goherdeşt a Kercê bû, cihê heyrîman û kiryareke nemirovî ye.

Hemîd Nûrî, bi zêdenavê "Hemîd Ebasî", li tawana bidarvekirina bi kom a sedan û hezaran girtiyên siyasî û dijberên rêjîma komara Îslamî de beşdar bû û piştre ji aliyê dezgeha dad a Swêdê ve biryara girtîgeha hetahetayî li ser hatibû dan, li hember azadkirina du barimteyan ên bi navên "Yûhan Filodrûs û Seîd Ezîzî" yên xelkê Swêdê, hate azadkirin û radestî rêjîma tawan a komara Îslamiya Îranê hate kirin.

Bi vê sedemê, em tevî nîşandana bêzariya xwe ji vê biryara nadadperwerane ya dewleta Swêdê, daxwaz ji civaka navnetewî û navendên mafê mirovî dikin ku li derheq vê danûstandina rêjîma mirovkuje komara Îslamiya Îranê û dewleta Swêdê, bêhelwîst nebin




**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Birêveberiya Giştî**
**26ê Cozerdana 1403 a Rojî**

# Pîroz be 44emîn salvegera avakirina Radyo Dengê Kurdistana Îranê



**N. Nûredîn Sofîzade**



Piştî serkevtina şorişa gelên Îranê bi dijî rêjîma dîktatore Mihemed riza Şahê Pehlewî, û piştre hatina ser deshilatêye rêjîmekî dîktatortir ji ya pêş xwe anku rêjîma kevnarperwere komara îslamî bi rêberiya Xumeynî, ku bersiva daxwaziyên xelkê azadîxwaze Kurdistanê bi agir û asin û êrîş û kuştarê hate danê, dema ku dengê azadiyê li seranserî Îranê de hate fetisandin, 44 salan berî niha di roja 27ê Cozerdana 1359a a Rojî, û li germiya xebateke rewa û berxwedanekî bê mînak ya xelkê Kurdistanê hêza gernase pêşmerge de li hember êrîş û kuştara rêjîmê li ser gelê me, herwisa xebat bo bi bidestveanîna maf û azadiyên xelkê Kurdistanê ku berdewamiya tevgereke mafxwaziya netewî ya geleke xedirlêkirî bû, Radyo Dengê Kurdistana Îranê perdeya tarîtiya sansor û tepeseriya sîstematîk a propagandaya desthilata dijîgelî ya komara Îslamiya Îranê li Kurdistanê de dirand.

Radyo Dengê Kurdistanê ku ji aliyê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve û bi peyama rêberê mezin û lêzan û Sekreterê Hizba Dêmokrat , Şehîd "Dr. Qasimlo li 27ê Cozerdana sala 1359 a Rojî dest bi weşana bernamên xwe kir û hate avakirin û wek Dengekî bi gur û heqbêj bû dengê azadî û mafê netewî, hevdem digel vexwandin û piştevanî li rewabûna tevgera Kurdistanê, pêşmergan li hember leşkerê kevnarperwere rêjîma Îslamî, bi dengê xwe yê zelal li hember pirûpagenda bi jehr ya tejî direv û a rêjîma cinayetkar de sekinî û bo xelkê Kurdistanê bû çavkanuyeke cihê bawer û hitbarê.

Dengê Kurdistana Îranê tevî hemû astengiyên nebûna alavan û cihguherînên berdewam bi sedema şer û êrîşa li Kurdistanê, erkek giran a ragihandinê kevte ser mila, li hizir û wijdana çendîn nivşên Kurdistanê de bi awayekî bi şan, bûye bîranîneke mezin çi mal û kes li Rojhilatê Kurdistanê nebû ku dengê wê Radioyê guhdarî nekiribe û wekî neynûka rastiyan digel deng û basên wê derbas nekiribe.

Kesên avakerên Radio Dengê Kurdistana îranê, û hemî ev kesên ku li gihandin, nivîsîn û amadekirin û tomarkirin û belavkirina bernameyên Radyo Dengê Kurdistanê de rol û bandor hebûne û ked û zehmet kêşane, û kar li wir kirine, gelek kesên mandînenas û fîdakar û dilsoz bûne û renge nav anîna wan tomarên mezin bixwaze, Lê kesên ku li rêkxistina Radyo Dengê Kurdistanê û li ser pêragirtina vê li dijwartirîn rewşan de li wir kar dikirin û baştirîn qonaxên temenê xwe li wir danîn ku beşek ji wan hatine şehîdkirin û beşek ji wan koça dawiyê kirin û beşek ji wan jî hêj li çepera avakirina Radyo Dengê Kurdistana Îranê anku Hizba Dêmikrat a Kurdistana Îranê de mane bo her tim li hizir û bîran de dimînin. Kesên ku nav û deng û sîmaya wan beşek ji "Radyo Kurdistan"ê bûye, niha jî wek hêmayek û sembola vî degngê heqbêj, têne naskirin û li cem hevçeperên wan û xelkê Kurdistanê cihê rêz û pêzanînî ne.

Niha ku 44emîn salvegera avakirina Radyo Dengê Kurdistana Îranê bi bîr tînin, tevî ku alavên din ên pêwndîgirtin û gihandina zanyariyan û ragihandinê ên wek Têlêvîzyon û torên civakî û bi giştî internet û soşyalmêdia, cihê radyoyê girtine, lê taybetmendiyên Radyo Dengê Kurdistana Îranê wek take ragihandinek ku li qonaxeke taybetî ya xebatkarane de erkek giran danîbûne ser milê vê, bo gelek ji têkoşerên Dêmokrat û xelkê Kurdistanê, cihê naskirin û bi biranînê ye.



Bi vê hilkevtê û 44 emîn salvegera avakirina Radyo Dengê Kurdistana Îranê de tevî bilindnirxandina vê yadê û rola bilind a avakerê Radyo Kurdistanê, em ti carî nirx û keda ku bo wê Radioyê hatî danê ji bona gihandina wî dengê mafxwazî û heqbêje tevgêra berheqe gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, em serê xwe li hember riha wan kesên ku bi her awayekê îca şehîd bibin yan koça dawî kiribn ditewînim û rêz û pêzanînê li hember keda heçî kîjan ji xebatkarên dinê ku li radiyo dengê kurdistanê de kar kirin û rol hebûn nîşan didin.

Li dema ku em basê wan kesan dikin ku rol li avakirina wê Radiyo yê de hebûn, em nikarin basê rol û ked û nirxa girane kesekê nekin ku ev jî Nemir Muhendis Riza Xeyatî ye ku berpirs û mihendisê Fenî yê Radiyo yê bû ku her li yêkim roja avakirnê weke zarokekî xwe Radio li himbêza xwe de xwedî kir û û mezin kir û parast û bi wefadarî û sozek ku dabû rêberê mezin Dr. Qasimlo heta dawî nefesa xwe her li wê radiyo de ma û bi xeyal û xevin û komek xwezî û hivî, mixabin koça dawî kir. Ew xebatkar û azadîxwazekî xeyrî Kurd bû ku tenê baverî bi azadî û dêmokrasî û hevxebatiyê hebû ku mixabin li vê rêkê de gelek nirxên mezin dan, lê bi serbilindî ço nav gorê ku heta Kurd û xebat heye yad û navê Mihendis jî her zindiye.

# Koy,kur çiya şax,baba giş navên mala Xwedayê mezin in



**N. Kofixwar**

Çiyayê Mereto(2973m) Meleto yan Mereto,çiyayekî li Bakûrê Kurdistanê bilindtirîn çiyayê li herêma Xêrzanê ye(di navbera Êlih,Diyerbekîr,Sêrt,Bedlîs,Mûşê de ye).Sason li pişt vî çiyayî ye.Ji çiyê gelek cihên mîna Êlih Mêrdin,Amed,Nisêbin,Midyad xûya dike.

Mereto peyveke Aramî ye.Navekî kevnar,navekî pîroz e ku wateya hikumranê dinyayê ye,Mala Xwedayê mezin Marduk e.Cî warên serhildana Mala Eliyê Ûnis e ku bi dawiya 12 salan şûn de nivê eşîra xwe di şêre qehremenî de wenda dike.

Qirîna -ku ji ber destdirêjiya leşkerên Komara Tirkiyê yên hirç û hovane xwe diavêje çêm- ji rindika rindikan Rindexana keça mihemmedê Eliyê Ûnis e.

**MERETO çi şahidên çend komkujiyên Kurdan î!Dema ku dewletê mal û milk tev dexl û dan,ajalên gundîyan şewitandin;di sir û seqemê de,di germa havînê de,di ba û bagerê de ku kurd bi tenê mabûn cil û bergên xwe,Mereto te kurd di hembêza xwe de,di şikeftên xwe de bi gîya,çêre û nebatan xwe ve xweyî kir.Tu bûyî jingeh,tu bûyî stara kurdan.Tu mala Xwedanê mezin bûyî ku te bi her awayî ewan parastin.**



**Gurnî(Astragalus)**

Piştî ku leşkerên ropê ji jêr ve gundî gûlle baran dikirin,ewan jî neçar ji ber tunebûna gûlle û baranan ji jor ve bi avêtina kevir kuçikan,bi şewitandina gurnîyê ku wekî birûskên gilover ve şer dikirin,zar û zeçên xwe û zûrriyeta xwe diparastin.

Mereto tu şahidê hemû bizavên destên qirej î,Mereto tu şahidê şerê mêrxasan,esl eselatên kurdan î.Herweha şahidê barandina hesirên wan î bi hêrs î ku tê bêjî agir jê dibarîn gava ku yek ji wan dihate kuştin.Çi zar û zêçen te dixwastin Mereto!

Berîya avakirina komara ropê (ji Tirkan re Bakûri hêj rop dibêjin)jî piştî komarê jî li Bakûrê Kurdistanê tu aramî rehetî nedî.Tirkan bi deq û dolapan ve soza ku dabûn êl êşir giregir,şex û melle û malmezinan,li Bakurê Kurdistanê bi cî neanîn. Kurdan îcar jî disa wekî her carê bi dostane bi safî û pakiya dilên xwe ji wan bawer kirin,pêşeroja xwe bi tirkan ve girêdan.

Dewleta tirk çi kir? Piştî ku himê xwe saxlem kir bi lez û bez reng û awaza pergala dewleta xwe ya di sala 1924 an de ya ku bi devkî wekhevîbûna kurdan pêjirandibûn guherand.Dîyar kir ku dewlet ji îro şûn de bi tenê ya tirkan e.

**Bes ev guherandin bû sedema destpeka jenosîda Kurdan.Tirkan pişta xwe dan Îngîlîz û Rûsan berê xwe dan kurdan bi hirç û hovane êrişê kurdan kirin.Gilî û gazin,birçîbûn û mirin,qîrîn û hawar tevlîhev bû.Bes kurd wekî her demê bi serbilindî xweyî rûmeta xwe bûn,serê xwe netewandin.**

Rûdana serhildana Sasonê li dijî vê pergal rebaza bê insanetiya tirkan e,dengvedaneke bi kesr û azar e.Kurd neteweyeka bêaqubet e ku her û her kuştin,derd keder dibe para wan.

Sal 1925 e,xwînxwar raserîkurdan in, ji pey topkirina bacan ketine.Bi serê her heywanî bigir heta baca rê çêkirinê gelek cûre bac hebûn.Komarê salê carekê ev bacan ji herkesî hildidan,bes bo ku kurdan bi her awayî tunebikin bona ku debara xwe bi cî nebînîn salê sê û çhar caran ev bacan kom dikirin.

Dixwastin kurd xizan û belengaz bimînin,tu caran ranebin li ser xwe li dij wan dernekevin, dewa doza xwe nekin, neçar bimînin,her serê xwe li ber wan xwar bikin.Komarê li wê salê jî wekilên xwe şandin li nav kurdan bo bac stendine. Hatin gundên derûdora bintara Çiyayê Mereto doza bacan kirin.Bi ser de wê destdirejiye bikin namûsa kurdan ku bibe sedema komkujiyê.Her çi gund hebin dane ber rêze dest bi şerekî mezin yê ku bi salan bidome kirin.Geh kuştin,geh dîl girtin.Bona çavtirsiyê,bona şkestina hêviya kurdan serê yên dîlgirtî jê kirin.

Dawiyê yên zindî ketibûn bi destên wan ew jî nefî kirin li Roavaya Anatolîyayê.Bes bermayiyên -ku nîvê mala xwe ji şerê bi salan domdar de hatibûn kuştin-mala Êliyê Ûnis xwe avêtin Li Rojavayê Kurdistanê.Divê bê zanîn ku heta zanîn ku heta hetayî tu komkujiyên kurdan nayê ji bîr kirin.Divê bê zanîn ku 'dijminê bav û kalan tu carî nabin dostên lawan'. Divê bê xwendin şerê Mala Êliyê Ûnis mala mêrxasên şerwan,mala canik camêran.

Divê bê zanin û şiret jê bê girtin ku derûniya kurdên belangazên nezan ji ber zor û zextên serweran çawa xirab bûye ku tenê bo piştmizdaneka bê xîret bona du quruş têkevin bi destên wan çawa hawrêyên xwe,xwişk û birayên xwe dane li ber destên wan. Piştî teslîmkirinê jî çawa ber bi çavan serê wan serjê kirine.

**Bi hêviya Kurdistanên serbixwe û azad.**

# Çîrok: Şeqam bas ji bûyerekî şorişa “JÎNA” yê li Rojhilatê Kurdistanê dike



N. Bêhzad Qadirî





Ev Çêroke, berhema mi a herî nû ye ku bo pêşberkêya çêroknivîsiya yekêtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê “nûneratiya Ewropa” min nivîsîbû.
Çêroka “Şeqam” ji aliyê desteya dawerênwê pêşberkê ve weke 13 çêrokên yyekem hate hilbijartin û hate wergêrandin bo ser zimanê Erebî û li govara Pênûsa Azad de jî hate weşandin.
Herwisa roja 19ê Cozerdanê jî li merasimekê de li welatê Alman xelatê Yekitiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê jî bidest ve anî.
“ŞEQAM” bas ji bûyerekî şorişa “JÎNA” yê li Rojhilatê Kurdistanê dike.

**Deqa Çêrokê:**

- Ew şeqamane heta niha jî di min de zîndî ne. Kolan di min de bûne demar û hin caran serhildêrek tê de ji dayîk dibe û hin caran jî şehîdek tê de tê veşartin. Di min de, di canê min de, di ruhê min de û ji wan çirkeyên ku jiyanê dikim, bi hezaran hêvî jiyane û bi sedan jî mirine, niha jî dijîn û dimirin, dijîn û dimirin.
Şeqam ew kiribû bi helbestvan. Kolan ew kiribû bi çîroknivîs. Birîn ew kiribû bi pola. Gelek bi rindî peyv dihatine ser devê wê, lê ew peyvane wizeya rawestanê li ser kaxezê nebûn. Dixwast kesek peyda be da ku peyvan ji bo wê ram (kedî) bike da ku di mêjiyê wê yê aloz de wunda nebin. Digot:
- Ew peyvane tijî ne ji axavtin û behs. Dinyayek xeyal û wêne ne, wek nîştimanê ku tenê peyvek nîne. Wek dayîk. Ez dibêjim şeqam, dibêjim kolan, tu jî wan bîne nav mêjiyê xwe. Tu wan binivîse. Vebibêje. Bila bixwînin û xeyal bikin. Bila bixwînin û di wan şeqaman de bijîn ku min tê de jiyan kiriye. Bila di wan kolanan de bimirin ku ez tê de hatime kuştin.
Hin caran min hest dikir ku berpirsayetiyek gelek mezin xistiye ser milê min û min şiyana hilgirtinê nîne. Peyvên wê hêşta germ bûn, wek dilê ajelekê ku ji nû ve hatî serjêkirin. Hilm jê radibû, wek xwîna nûrijiyayî ya qurbaniyekê. Peyvên wê wekî “ba” tu bi xwe re dibirî. Min çend caran di nav şeqaman de bi wê re kevir avêtin. Ez bi wê re reviyam û keftime xwarê. Heta ez çend caran jî birîndar bûm. Min seh bi germahiya xwînê dikir ku ji aliyê ranê min ve dihate xwarê û diçû nava pêlavê min. Carê wisa jî hebû min seh bi germahiya destekê dikir di nav destê xwe de. Digot:
- Ruhê min di wan şeqaman de bi cih maye. Niha jî hestên min di wan kolanan de evdal in. Qedeman lê nadin, li pey min digerin. Ez bi xwe jî niha li wir im, nizanim! Belkî ez wunda bûbim yan ez wunda kiribim. Wek çawa min jî hin kes wunda kirin yan ji min wunda bûbin. Yan ji me wunda kirin, em ji hev veqetandin.
Şeqam! Dinyayek hêvî xistibû hembêza xwe. Dinyayek hawarên bidîlgirtî tê de hatibûne azadkirin. Êdî ewa şeqam bû ku nîştiman li ser zarê wê bû. Ewa şeqam bû ku bibû çiya û hemase tê de dihate afirandin. Ewa şeqam bû ku bibû bi hêma û nîşane û li ser zaran bû. Digot:
- Şeqam ne tenê hêviya şax, belkî hêviya nîştimanê jî bû. Erê şeqam! Dengê me bilind bû, me hest dikir di lûtkeya çiya de ne. Pêngavên me bihêz bûn, me hest dikir nîştimanek di demarên me de ye. Dilê me xweş bû û pişta me gerim bû, çiya û dol û deşt bi me re hevdeng bûn. Şeqam hem hevçeperê berevanî bû û hem jî qada helmetê bû.
Piştî axaftinên wê, ez fêr bûm ku hez ji şeqam bikim. Wek çiya. Fêr bûm ew ê ku keviran diavêje, hejê bikim, wek pêşmerge. Kolan, avero, tirimpêl û ewa ku bikare kesekî veşêre, ez jê hez dikim, wek nîştiman. Digot:
- Berê ew çetane tenê ji çiya û darên Kurdistanê ditirsiyan, lê niha ji şeqam û kolanên wê jî ditirsin. Ji dirûşman behecîbûn, ji “Jin, Jiyan, Azadi”yên me behecîbûn. Me kevir bi ser wan de dibarandin û me digot: “Kurdistan, Kurdistan, goristana faşîstan”. Hawar û dirûşmên me roj li pey rojê zêdetir ew rastî tirs û nigeraniyê dianîn. Dar û kevirên şeqam rabibûn.
Min hest bi hêz û germahiya dirûşmên serhildêran dikir. Min hest bi tirs û nigeraniya nav dilê dagîrkeran jî dikir. Min dianî ber çavê xwe: Komek kur û kiçên serhildêr, rûyên wan ên veşartî û destên bi mist, di şeqaman de rû bi rûyê dagîrker dibûn. Dirûşmên wan di guhê min de deng vedida: “Em xortên Pêşewa ne, ji bo nîştimanê canfeda ne.” Ax Pêşewa li kuderê yî! Xortên te rabûne û navê te di nav şeqam û kolanan de belav bûye. Digot:
- Ez û ew, sibêzûyan digihîştine hevdu û me heta dawiya şevê şeqam û kolan dadixistin, me agir hil dikir, me dîwar dixemilandin û me bi yên dinê re dirûşm digotin: “Jin, jiyan, ranewestan, azadî bo Kurdistan.” Ey Xwedayê min, em çiqas kêfxweş bûn. Herçiqas ji me dikuştin û birîndar dikirin, lê em bi kerb û kînên zêde ve dirijiyane ser şeqaman û me hawar dikir: “Heta Kurdek bimîne, Kurdistan jî dê bimîne.”
Ax Kurdistana min! Kîjan ax (xak) bi qasî te xwîna xortên wê li ser hatiye rijandin? Kîjan şeqam bi qasî şeqamên te berxwedan tê de hatiye kirin? Axo tu kengê aram bigirî da ku ew xortên te yên newestiyayî bi te re aram bigirin? Ax felek! Em heta kengê her ax hilkêşin û dayîkên me yên cergbir ax hilkêşin? Digot:
- Me sibêdeheke dinê dîsan hev girt da ku em şeqaman bihejînin. Ji nişkê ve li cem min keft. Xistiyan. Min bi destê xwe şûna gulleya nav çavê wê keftî girt, da ku xwîn nepeşke. Ax hevala min! Wê rojê li ser gora wê bûm, min bi xwe bi axê spart û min ax avête ser termê wê. Me reş li xwe nedikir, me tole hildida. Roj nebû caş û pasdar neyêne kuştin. Me goristan kiribû qada lihemberderketin li dijî dagîrker, rast wekî şeqam.
Min bi wê re kevir avêtin. Min hawar kir. Min agir hil kir û li ser dîwaran nivîsî. Bi wê re reviyam û min êrîş jî kir. Bi wê re jiyam û mirim. Lê gelek dijwar bû bi wê re hevalê xwe yê wek bira bi axê bispêrim! Êş û xemên wê bo kesê nedihatine hilgirtin. Tevahiya laşê wê reş û şîn bibû û saçme (gulleyên tifingê) pê ve diveriyan. Digot:
- Cudahiya seyê reş û spî nîne. Min çend rojan xwe bo wan veşart û min yek ji wan ji malê anî derê. Min rast li şûna gulleya navçavê hevalê xwe, kevirek li eniya wî xist. Ax tolehildan çiqas arambexş e. Herçiqas bi sedan gulleyên saçmeyî li ser laşê min xistin, lê min hest pê nedikir. Ax ku tolehildan çiqas arambexş e.
Dûrwelatî bibû, lê ruhê wê her li şeqamên Rojhilatê bû. Ew rojên borî her di nav bîr û xeyalên wê de bûn ku şeqam di destên wê de bûn. Dirûşmên wê demê her li ser devê wê bûn. Digot:
- Min niha jî guhê xwe bo şeqaman ragirtiye ku gazî min bikin. Ez li wir mirim û her li wir jî zîndî dibim. Bi sedan çîrok di wan şeqaman de hatine veşartin û pêwîst e bêne peydakirin û behskirin.

## Nerîna



**“Mesrûr Barzanî”:**

**“Divê her roj bibe roja parastina jîngehê”**



**“Mustafa Ozçelîk”:**

**“Cejna Qurbanê bila bibe destpêka azadî, aramî û hevkariyên netewеyî”**




**“Pat Ryder” :**

**“ Hebûna Pêşmergeyan di rêgirtina li şiyanên DAIŞê de bibandor bû”**




**“Rafaêl Girûssî”:**

**“Lihevkirin digel Îranê êdî ti watеyek nîne”**

# Bombexwaz dawiyê li civînên ji bo rêkeftina etomî tînin!



**N. Eskender Ceiferî**



Mezintirîn bombexwazên Rojhilatan Navîn, berpirsên rêjîma faşîstên Tehranê ne. Di rojên derbasbûyî de rêjîma Îranê careke din civînên ji bo rêkeftina etomî bi dawî anîn lê di hember de car din îdia kirin ku ew bombeyê naxwazin.
Ev jî hevdem e ligel gitinên lidij. Elî Şemxanî şêwirmendê ewlehî yê Elî Xamineyî dibêje heke Îsraîl û Rojava siyaseta xwe neguherin, dê Îran bombeyê berhem bîne.

Lê berpirsên din ên Tehranê tişteke din dibêjin û îdiayê dikin ku ew bombeyê naxwazin.
Ev jî di demekê de ye ku Berîtanya dibêje Îran dikare tenê di 2 rojan de biryarê bistîne û rêkeftin bê kirin.
Lê dîsa jî Rojava li bendê ye bizane kî dê bikeve dewsa Îbrahîm Reyîsî serokkomarê rêjîmê ku di hêlîkoptêrê de hate kuştin.
Di dema desthilatdariya Hesen Rûhanî de, roja 14ê Reşemeya 99’an, Mihemdcewad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihandibû ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Lê di hember de welatên Berîtanya, Feranse û Almanyayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Niha Rûsiye jî dixwaze dorpêçên li ser Rûsiyê jî bêne rakirin da ku ew rêkeftinê qebûl bikin. Lê belê Amêrîka dibêje ew dorpêçên ji ber êrîşa Rûsiyê ji bo ser Okraynê nayên rakirin.
Pişt re Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz hertim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Di rastî de armanca rêjîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyandina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzîkî berhemanîna bombeyê dinbin.
Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandiye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.
Îsraîl jî bi Amêrîkayê re hevnerîn e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.
Komara Îslamî jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amêrîkî dabû û gotibû: Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amêrîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yên Ewrupî bûn.

Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yên welatên ku peyman îmza kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amêrîkayê bû, li ser helwesta Amêrîkayê ya li ser mijara Îranê dabû xuyakirin ku helwêsta nelihevkirinê ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amêrîkayê bi Îranê re û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Fransa, Brîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji dest bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniyên Wezareta derve ya Îranê, derket holê ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.
DYA bi raportên çalakiyên etomî yên Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezareta Derve ya Amêrîkayê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amêrîka di wajokirina raportan de dudil e û sedem çi ne lê bi gotara Şemxanî zelal dibe ku dorpêçên nû yên aborî, gefê li rêkeftinê dikin.
Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlîbûna welatên ewropî hatibû wajokirin û li gor wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.
Îsraîlê ji destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropiyan li Amêrîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor.

Brîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yên Îranê demlidest wajo bike lê Amêrîka li pey planeke din digere.
Ji bilî berpirsên bilind ên Îsraîlê, fermandarên wan jî didin xuyakirin ku heke rêkeftin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike.
Almanya, Brîtanya û Fransa ku roleke mezin di rêkeftinê de hene, dibêjin bi meyandina zêdetirî 20 ji sedî ya Oranyomê, êdî derfet ji bo rêjîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê ji bo ser cîhanê bibe gef. Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pizişkî û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cîhanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna dbombeyê têne bikaranîn.
Li bendê ye di rojên bê de armanca rêjîma Tehranê ji bo meyandina vê asta Oranyomê eşkere bibe.

# Ez perwerda dagîrker naxwazim



N. Sumeye Mêrxaz




Ji dûr ve sekinî û li wê avahiyê biçûk û kevin nêrî.
Dît zarok yek bi yek dikevin wir . got:dayê?min li vir nehêle..!!

Dayika viyan kenî û got: keça min, ev roja te yekemîn e li dibistanê ,çawa tu naçî?

Sibe tuyê bixwînî û bibê mamoste.viyan bê deng destê diya xwe berda ,berê xwe da dibistanê û çû.

Dema ket dersê ,dît mamoste bi hêrs deng dikê bi zarokan re ,lê viyan tiştekî jê fêm nakê ,çû li cihekî rûnişt.

Bû nîvro û zarok bi giştî ji dibistanê derketin malê.

Viyan gihîşt mal , çû cem diya xwe û jê re got:dayê! Ez nema diçim dibistanê.

Dayik matmayî ma û got:çima keça min?

Viyan:ji ber ku ez peyvekê ji mamoste fêm nakim.

Dayik: na keça min, piştî demek kin tuyê fêrî zimanê wan bibê û ji wan fêm bikî.

Viyan: dayê, çima mamoste jî wekî me napeyvê?

Dayik nema dizane çi bersivê bidê,lê dîsa rûyê xwe vekir û got:

viyana min,ez dixwazim bi te serbilindbim.

Çend sal derbas bûn û viyan fêrî dibistana xwe bû û çend hevalên wê çêbûn.
Rojekê ji rojan viyan vegerî mal û rûyê wê xemgîn bû. Dayik jê pirsî çi heye ?

Viyan lê nêrî û got: mamoste got bila sibe diya te were dibistanê.

Dema sibe bû ,dayîk çû dibistanê ,lê viyan nexwast herê.

Piştî demek kin dayik hat û rûyê wê sor bûye.

Destê xwe rakir û sîlek li rûyê viyanê xist û bi hêrs got:

sibe tuyê vegerê dibistanê û tu carî li hember mamosteyê xwe nesekinî.

çavên viyan tijî hêstir bûn û got :dayê , min tu neheqî bi mamosteyê xwe re nekirî ye , tenê min jê re got ma ne bese em bi zimanê Erebî dixwînin .

we zimanê înglîzî jî ji me re anî. çima em bi kurdî jî naxwînin.

Dayik dîsa li ber pirsa keça xwe lal ma nizanî çi bêje ji vê keça heşt salî re.

ewê çawa jê re bêje ku zimanê kurdî qedexe ye, ewê çawa fêmî keça xwe kê ku rewşa kurda di çi zilm û zorê da ye.

Roj berbas bûn û viyan vegerî dibistana xwe, lê hîn pirsa wê bê bersiv ma.

Viyan mezin bû û çû ser tirba diya xwe , kulîlk danîn ser tirbê û got: dayê ez hatim ji te re bêjim, min hîn ew sîle jibîr nekirîye
Dayê bila serê te niha bi min bilind be.

va ez bûm mamoste wekî te dixwest , lê ez bûm mamosteyê zimanê xwe wekî min dixwast

Dayê ! emê çawa ji koletîyê xelas bibin û malbatên me ji zarokatiya me de hêştin em bêdeng bimînin li hember neheqîyê û koletîyê bi navê tirsê .



# XELK JI XWE RE XEYALÊN MEZIN DIKIN Û JIBO PÊKANÎNA WÎ JÎ XEBAT DIKE



N. Hasan Harrani

**Beşea 2**

Niha ez dixwazim bizanim ku çima Kurdan aqlekî dewletîyê ji xwe re ava nekir û çima her cara ku bi ked û berxwedanên mezin gelek destkevtîyên mezin bi destê xwe xistin û paşê çima derbasî destê hêzên miletên din bû?

Ev pirsekî gelek girînge ku divê her sîyasetmedar û rêberekî Kurd ji xwe re bike derd û serî li ser biêşîne, sedemên wê bibîne û fam bike.

Girêdan û têkilîyên nabeyna civak û dewletê tiştekî herî tevlîhev e. Komplîkeye. Jêre nêzîkatî û famayîyekî zanyarî û metodolojîk pêwîste. Van tiştan rastgele û eletewşî nabin. Qadekî zanyarî ya cîvakî û îdarîye û jibo famkirina vê qadê mirovên bi hejmara xwe zêde û têrî xwe zane pêwîstin. Ev qad di jîyana komelgehî de qadekî herî kevnare û jenandina vê qadê divê bi kesên zana û têr perwerdekirî bête famkirin û bête meşandin.

Mixabin Kurd ji vê yekê pir pir xerîb bûne û ti carî nikarin vê qadê fam bikin û li gorî wî kar û barên xwe bidin meşandin.

Du sed salên dawî de Kurdan gelek rêxistin ava kirin. Bi gelek îdeolojî û zanyarîyên sîyasetê emelkirin. Bi van yekî jî bi serneketin. A rastî di vî du sed salî de van tiştên ku serî lêdan û di jîyanê de bikaranîn ti dibê qey hemî jibo ceribandinê hatin û derbas bûn.

Bi rastî wiha bû. Yanî yekî girtin destê xwe gotin emê bi vê fikra rehberî biserkevin. Lê heya derekî şûnde têk çû. Paşê gotin ev nebû îcar em bi ya din dest pê bikin. Ew jî têk çû.

Welhasil ev nebû ya din. Yanî geh ji xwe re ol kirin rehber, geh îdeolojîyên rastgir, geh jî îdeolojîyên çepgir ji xwe re rehber qebûlkirin û bikaranînin. Carinan jî doktrînên din yên sîyasî li cîhanê. Hemî jî di dawîya dawîn de encamên wan têkçûn bû.

Dema armanc wekî ceribandinê be wê demê bawerî jî bi van raman û îdeolojîyên wiha zû diqede.

Kurd ji ber ku dermanê çarenûsa xwe baş nizanin wekî cil û berg biguherînin îdeolojî û doktrînên sîyasî diguherînin. Ev jî bi xwe re felaket û libinhevketinên mezin derdixe holê.

Me got ku pirsgirêk ne zêde di îdeolojîyan de ye. Di îdeolojîyan de jî pirsgirêk hene tabî. Lê bi temamî ne ev e. Ger bi temamî ev bûya çel sal berê li Îranê şerîet bisernediket. Îro tevgerên wekî ÎŞÎD li rojhelata navîn bablîsok û tofan ranedikir. Tabî kî îdeolojî an jî fikriyatên rehberî di rêvebrin û sazkirina jîyana civakî ya komelgehî de girîng e. Jibo pergalek jîyandirêj, demdirêj û pêşketî reng û mantelîteya îdeoljîyan an jî fikrîyatên rehberî girînge. Lê di pêvajoya tekoşîna serkevtinê de bawer bikin vê yekê zêde ne pir girînge. Ya girîng zanîn û kemilandina te ya rêveberî, famkirin, li gorî hemleyên dijminê xwe hemleyên aqilane û pûçdar bikar binî ye.


Kurd ji dewlet û aqilê dewletê dûre û bîyane. Ji famkirina vê qadê re jî acize. Hişê wî nagire. Lewre me got ku ev qad qadekî komplîkeye. Kodên vê qadê hene. Van kodan di nava pêvajoyek hezar salan de hatine çêkirin û bicîhkirin. Di veristandina dewletê de aqil, exlaq ûjdana mîstîkî nîne. Vana ên nava civakêne û dewlet ne li gorî van avabûye. Her wiha li gorî vana jî tevnagere. Di demên aştîyê de vediguhere rû û normên civakê li di demên awerte de ti carî guh nade van normên civakê. Jixwe ger guh bide ev dibe sedema dawîbûna wî.

Dewlet duzayendîye. Di mercên aştî de bi piranî rûyê wî yê civakîye lê di zirûfên awerte de rûyê wî bi temamî diguhere û çav guh û dilê wî ji ew normên civakê ên civaka xwezayî re girtîye. Ew exlaq û ûjdana ku di dilê gel de heye di ê dewletbûnê de nîne. Ger hebe jixwe ne dikare xwe û ne jî dikare civakê birêve bibe. Loma jî ev xal di pencereya civakê û gelde wek bê exlaqî, bê ûjdanî û bê merehmetî tê famkirin. Lê man û hebûna dewletê ev e.

Ûjdan û merehmeta li dilê Kurdan hatîye bicîkirin ne ya dewletbûnê ye. Ya fikra xwedanî a dilovanîye. Ew Xwedanî jî ne yê ew Xwedanê ku di olên dewletî de bi cîh bûye. Ew Xwedanî ya herî kevnareye ku bi civakêreye û di nava dilê wan de ye. Loma jî dewletbûnî û aqilê dewletbûnîyê li dij vê rastîyê xuyadike û ji wan re gij tê.

Îro ew sîyaseta Kurd ku vê yekê ji xwe re rast nabîne û wek xeter dibîne jî di bingehê wî de ev rastî heye. Lê tenê ne ev rastîye. Tiştekî din jî heye. Ew jî bi xwe nebawerîye.

Xûyekî mirovan ê rovîyê heye. Tişta nekaribe bike şaş an jî xerab dibîne. Çawa ku rovî tirîya ku negêje dibêje tirşe-hesirme, Kurd jî dibêjin şaşe, xerabe û xetere. Lê di şert û mercên cîhana heyî de ne şaşe, ne xerabe û ne jî xetere. Pirsgirêk nelihevbûna exlaqîye ku ev exlak çawa û ji hêla kî ve ketîye dilê Kurdan e. Ev xale ku nahêle Kurd mijara dewletê, dewlet û civakê û civak û jîyana komelhehî fam bike. Ji ber ku nikare fam bike jê direve. A rastî komplîkebûna vê qadê dibîne, ji ber ku kapasîta wî ya famkirin û têgihiştinê li hemberî vê yekê gelek gelek kême şûna fam bike, jê direve û wî wek xeter û nebaş pênase dike.




Ditirse.Tirsa wî ji vê lewazbûna wî ya zanîneye. Nezanî tirs û bê ewlebûna herî mezin e.

Bi gorî nêrîna min, di famkirina dawî de Kurd ne ku dewletîyê şaş dibîne naxwaze. Kurd bi xwe bawer nîne ku dewlet ava bike û birêve bibe loma naxwaze. Gotinekî Demîrel hebû. Digot, "Kurd nikarin dewlet ava bikin. Ti ji wan re ava bikî jî nikarin îdare bikin."

Demirel rast digot. Wî di wê demê de rih û angaşta Kurdan baş famkiribû. Mixabin rastî ev e. Tekoşîna rizgarîya Kurd ji nû ve hewceye were nîrxandin û bê analîzkirin. Lê bi çav û nêrînek nû. Bi nêrînek wiha divê bê analîzkirin ku wekî Kurd xwe ji nû ve kifş bikin, bê kirin. Ne li ser înkarkirina bedêl û kedên hatine dayîn ne jî kêmasîyên hatine kirin rewa bên dîtin.

# Wan bi mêrxasî şer kirin û wek mêran mirin!



N: Rojan Kurmanc
W: Hesen Mukerem

**Beşea dawî**



Lê keleh dîsa li ber xwe dide û vê carê ava şêniyên kelehê qut dikin! Deriyên kelehê vedibin.

Esker û xamxwar dikevin kelehê! Mêr tev şer dikin û li pey hev dikevin erdê! Leşkerek dîwarên kelehê nîşan dide! Li wir çi diqewime?

Rengên zer, sor û kesk li serê dîwêr difirin! Belê, ew keç û jinên Kurd in ku bi wan cilên rengîn li ser dîwarên kelehê li ber avêtgehê radiwestin!

Ji nişka ve dengê wan bilind dibe... Deng li her derê dizvire û xwe ji serê dîwêr davêjin binê avêtgehê da ku destê leşker û fermandarên padîşah negihîje wan!

Leşkerên Şah matmayî man! Li jêr li gelî de, lê bi gelek rengan, pir xweşiktir xuya dike.

Ev bû dawiya çîroka Emîr Xan, Emîr Xan Bradost an jî Lep Zêrîn ku navê wî di dîroka Urmiyê de nemir ma.

Wî plana xwe bi cih anî û Heft eşîrên Efşar barkir Urmiyê da ku herdem pêkhateya nifûsa vî welatî biguhere! Lê dengê Dim-Dim-ê dê her û her li çiyayan bê qîrîn û çîroka wê ji sîng bi sîngê ve were derbas kirin da ku piştî nêzîkî pêncsed salan dîsa navê Dim_ Dim li Kobanî were qîrîn.

Sedema koçkirina kurdan bo Xorasanê ew e ku kurd dûrxistine bo Xorasanê yan jî Şah Ebbas ji wan re pensa mêrgên kesk ên Xorasanê kiriye, da ku ew welat hêşîntir bibin sebeba yekê Şah Ebbas hêza dûrxistina Kurdan nebûye û ya duyem ma Xorasan ji Urmiye û rojavayê welat hêşîntir bûye ku Kurd bixwazin dev ji erdê û warên xwe berdin ji bo warek bêhtir? Emîr Xan Lep Zêrîn di koça yekem de 50.000 malbatên xizmên xwe şandin bo rûbirûbûna Ozbekan ber bi rojhilatê welêt ve.

qedera herêmê bi giştî guherand û bi êrîşên Tirkmen û Moxolan ve destê van hersê koman ji Xorasanê hat birîn.

Û Şah Ebbas jî, ku dîsa neçar e ku hikûmeta Xorasanê bide kordên wir, heya serdema Pehlewî, ku Riza Şah: Piştî salên dûrbûn û gelek zehmetiyan, heta îro hûn şahidê dastanên afirandina gelek jinan û mêrên vî welatî ne: Wek Serdar Tîfe Gol (Tîfeya golan) Serdar Êywez Naderşah û...: Di serdema Qacaran de, li gorî nameyek ku ji dîwana Qacaran hatiye, di bin sernivîsa ku divê Kurd ji devera Firûzeyê derkevin.

bi lez û bez û ber bi Şîrwanê ve paşde vekişin, lê gel neçû bin barê Zozçer û bi fermana Serdar Êywez Xan Celalî û pênc hevalên wî Serdar Tîfe Gol (hevjîna Serdar Êywez), Hesen Kurdo, Serdar Aras.

Bêygo û Îsa Xan tevî xort û keçên partîzan û serhedî rabûn ser piyan. Di şerê yekem de artêşa Rûs bi fermandariya Konstantîn Kaufman hat ku Fîrûzê bigire, lê Kurdan li bilindahiyên çiyayên Marko parastin û berxwedan kirin, gule û barût avêtin, gelek rûsî kuşt û bi ser ketin.

Piştî du salan, di Şerê Cîhanê yê Duyem de, artêşa Rûsyayê bi fermandariya Mîxaîl Skovîlov, li çiyayê Gog Tepe bi 2000 tivingan êrîşî Kurdan kir.



Ev şer nêzîkî panzdeh salan dom kir, di dawîyê de artêşa rûsî ya ku westiyabû, bi nameyekê ji Qacar re alîkarî xwest, û wan ji her du aliyan ve dor li Kurdan girtin, Serdar Êywez şehîd kirin û xelkê herêmê jin, zarok, ciwan û pîr kuştin Rûsan termê Serdar Êywez birin Fîrûzê û şahê Tirkmenistanê di vê mehê de hat veşartin.

Lê hevjîna Serdar Êywez ku di heman demê de keça pismamê wî bû, dev jê berneda û bi hevalbendên xwe re êrîşî Firûzeyê kirin û gelek Rûs kuştin û Firûze ji nû ve girtin, lê ji ber nebûna piştewaniyê û nebûna cebilxaneyê dîsa berê xwe dan çiyayan heta ku. Serdar Aras Û Îsa Xan şehîd ketin û Hesen Kurdo Bêygo jî di nav axa Rûsyayê de hat girtin û gulebaran kirin û Serdar Tîfe Gol jî bo Sîbîryayê hat dûrxistin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê


## Du birayên Yarsanî dîsan hatine binçavkirin

Du birayên Yarsanî ku li gîtîgeha vekirî ya rêjîmê de bûn, piştî zivîrîn bo girtîgeha rêjîmê li bajkarê Kirmaşanê, hatne binçavkirin û bo îdareya îtilaat li wî bajarî, hatine veguhastin.

Pêka rapora Kurdpayê, du birayên Yarsanî yên bi navê "Pûrya û Şuca`i Minnetî Menciqtepe" yên xelkê bajarê "Sehnê" ser bi bajarê Kirmaşanê ku li girtîgeha vekirî ya rêjîmê ya bi navê "Çişmê Sifîd" a bajarê Kirmaşanê de bûn, piştî zivîrî bo vê girtîgehê, hatine binçavkirin û bo îdareya îtilaat a rêjîmê li wî bajarî hatine veguhastin.

Heta niha sedema dubare binçavkirina wan du birayên Yarsanî nehatiye zanîn.

Ew 2 birayên Yarsanî li heyva Xezelwera 1401 a Rojî de li rêûresma 21emîn salvegera canjidestdana hunermendê Yarsanî "Xelîl Alînijad" de hatibûne binçavkirin û piştre bi tuhmetên "alozkirina aramiya giştî û lêdan û kutanê" ji aliyê taya 2 a dadgeha cezakirin a rêjîmê li bajarê Kirmaşanê de salek girtîgeh û lêdana 74 derbên qamçiyan bi ser wan de hatine sepandin.



## Xwendikareke rişta pizişkî bi sedema gef û givaşa deshilatdara dest havête xwe kuştinê

Xwendikareke Keç bi navê Sumeye Şefîeî xelka bajarê Sinê ku xwendikara rişta pizişkî ku li Têrma dawiyê bû, li Zankoya Zanista Pizişkî a Sinê, bi sedema gef û givaşên berdewame Mudîr û serokê Zanîngeha Bêhdaştê dest havête xwekujiyê.

Gorî rapora Hengavê, Roja Duşemiyê 21ê Cozerdanê, Sumeye Şefîeî temen 24 salî, xwendikara rişta Bêhdaştê, bi sedema gef û givaşên berpirs û serokê Zankoyê, bi armanca xwekujiyê li bilindahiya bînayekê ve xwe havête xwarê.

Gorî gotina yêk ji xwendkarên wê Zanîngehê, Sumeye Şefîeî li ser dewra karamûziya rişta Bêhdaşê, piştî ku digel serokê Zanîngehê kevte nîqaşê, serokê Zankoyê gef jê xwarin ku dê ji xwendinê bêpar bike û ji Zankoyê derêxe û çend roj bû ku ji aliyê berpirsên Zankoyê ve kevtibû ber gef û givaşan, lewra dest havête xwekujiyê û bi xwe havêtina ji bilindahiya saxtiman, cehd kir ku dawî bi jiyana xwe bîne.

Sumeye Şefîeî bi armanca lêkolîna pizişkî bo nexweşxanê hate veguhestin û gorî zaniyariya rewşa vê gelek xirabe û cihê nîgeraniyê ye.



## Rêjîma Îranê sizayê bidarvekirinê bi ser kolberekî de sepand

Ji aliyê dadgeha înqilab a rêjîmê li bajarê Urmiyê, bi tohmeta sîxurî bo Îsraîlê sizayê bidarvekirinê bi ser kolberekî de hate sepandin.

Li dadgeheke şanoyî de Ji aliyê dadgeha înqilab a rêjîmê li bajarê Urmiyê bi dadweriya "Riza Necefzade", kolberek bi navê "Îdrîs Alî" bi tohmeta sîxurîkirin bo Îsraîlê hate dadgehîkirin û sizayê bidarvekirinê bi ser de hate sepandin û navbirî li tevahiya wî heyamî de ji mafê parêzer, bêpar bûye.

Îsdrîs Alî digel hejmarek ji kolberan li devera sînorî ya bajarê Serdeştê mijîlê kolberoiyê bû ku digel 7 kolberan hate binçavkirin, piştre 5 ji wan kolberan hatine berdan, lê 2 kolberên din digel "Îdrîs Alî" li girtêîgehê de ragirtin ku li wir rastî hovanetirîn îşkerncayan hatine û "Îdrîs Aslî" neçar bi îtirafkirina bi zorê li ber Kamêrayan kirine û îtirafên wî li dadgeha şanoyî de wek belge bi kar anîne.

Îdrîs Alî li benda siyasiyan de hatiye ragirtin lê ji qedera 2 kolberên din ti zanyariyek li berdest nîne û ew li bendên cuda ji benda siyasî, têne ragirtin.



# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (472)